# Deqa li ser eniya Diya min

HELBEST

Giryan Seyro

2019

Navê pirtûkê:

**Deqa li ser eniya diya min**

Helbestvan : **Giryan Seyro**

Wêneyê qapê: **Dilvîn Alî**

Derhênerî û Nexşe ya qapê: **Xorşîd Şûzî**

Çapa yekem 2019z - 2631k

Amadakirina Çapê:
Sersera (Dr. med. Bashar Moustafa)
www.sersera.com

SerSera

Mafê çapê parastî ye

**ISBN 978-3-96640-009-1**

# Pêşgotin

Bi tevî hemi zehmetiyên jiyanê û rewşên Xerab yên ku rastî Kurdan li Sûriyê hatîn, dayika Kurd dimîne malzaroka hebûna wî, ku gelek astengî kişandine heya ku zarokên xwe xwedî kirine û ew hêdî hêdî fêrî zimanê wan yê dayikê kirine û herweha kesayetiya wan ya Kurdî avakiriye.

Dayika Kurd, ya yekemîne di cîhanê de ku bi lîlandinê pêşwaziya termê zarokên xwe yên pakrewan bûyî dike...

Û ew ya yekemîne seranserî cîhanê ku çek hildigre û di tenişta kurê xwe de di ber welatê xwe de şer dike.

Sed silav li wê dayika ku temenê xwe terxanî perwer dekirina me kirî, ku ji zaroktiya me ve û hîna em di pêçekê de bûn, em bost bi bost xwedî kirin.

Lewra ez xweş bawer im ku hemî pênûs û gotin nikarin heq ji mezinahiya dayikê derkevin û bi taybet dayika Kurd û heger hat û mirovek bê welat çêbû, wê qet neyê ku mirovek bê dê çê bibe.

Silav ji ya ku ji mêraniya me bi mirad nebûyî re..

Sed silav li giyanê te yê pak re..

**Bêwar Emoka** …………..

Rimêlan 25-3-2019

# Wilo bîrîdarim

**Ku ez bîriya diya xwe dikim**

**Digrîm**

**Gêjo mêjo dibim**

**Ji hiş diçim**

**Dilerizim**

**Dikevim erdê de**

**Û**

**Hêdî**

**Hêdî**

**Bi ser hişê xwe ve têm**

**Çavên xwe vedikim**

**Êdî bi yek carê**

**Kînê bi hiş re dikşînim**

**Rika xwe didime xwe**

**Serê xwe li dîwaran didim**

**Û**

**Har dibim**

**Dîn dibim**

**Û ji bîr dikim**

**Ku diya min miriye ...**

**Ha wilo**

**Ez bîriya diya xwe dikim**

**Û**

**Wilo**

**Wê ji bîra xwe dibim.**

**...... 02.08.2019**

# Bistika Tenûrê

**Ez wek bistika te ya tenûrê**

**Niha...**

**Li ser te disincirim**

**Yadê …**

**15.05.2018**

# Xewn

**Bila îşev xewna min tu be ...**

**Û Madam xewn e**

**Bila serê min li ser singa te be**

**12.12.2017**

# Diya min Efrîn e

**Piştî ku Efrîn dizîn**

**Diya min jî mir**

**Hejîrên Efrînê**

**Û keziyên diya min**

**Bihevre kizirîn**

**Melkemot Tirk e**

**Rihsitênek Tirk e**

**Diya min Efrîn e**

**Efrîn diya min e**

**Lê**

**Her yek e birîn**

**Keziyên yadê**

**Û çiqilên hinaran**

**Bihevre şewitîn**

**Bihevre kizirîn**

**Bûne tiraf**

**Bûne pereng**

**Û ez mame**

**Giryan**

**Giryanê şîn**

**Yê ku li ser giriyê wî**

**Kevir digirîn**

**De ji xwe şerm bike axê**

**Ji zîvirandina xwe**

**Ji giraniya xwe**

**Ji mezinahiya xwe**

**Ji deqa eniya diya min**

**Û ji kulên Efrînê**

**Yên ku bûne êzing**

**Yên şewitîn**

**Yên peritîn**

**Yên bûne qeşa**

**Li ser singa te**

**Û di singa min de**

**Bûne sing**

**Û sing çikilîn**

**De bêja**

**Hey bê 'erzê**

**Bê olê**

**Qûnekê erdê**

**Piştî te Efrîn kuşt**

**Te**

**Çima diya min kuşt ?**

**Û çima ji Qehbîtiya xwe**

**Nake Yeqîn**

**Çima ?**

**29.01.2019**

# Piştî diya min mir

**Piştî ku diya min mir**

**Ji nû mezin bûm**

**Ji nû min li  temenê xwe pirsî**

**Min dît ku pîrim**

**Ji nû.....**

**Min ji nû zanî**

**Kopal çiye**

**Tenahî çiye**

**Mirin çiye**

**Ji nû...**

**Min zanî helbest çiye**

**Û zûrzûr çiye**

**Nalenal**

**Û azarên ji dil**

**Piştî ku diya min mir**

**Min ji bîr kir**

**Jîn çiye**

**Û çawe bijîm**

**Û çilo ken di dêman de tê nîgar kirin**

**Û ax ji çirene**

**Ji nû...**

**Min xwe avête bextê Vodkayê**

**Bûm hevalê kundan**

**Çilçilîk û qirakan**

**Û ji qoziya şandelîkan**

**Birînên xwe, min kewandin**

**Piştî ku mir ...**

**Gih Sofî me, ji diya xwe re limêj dikim**

**Û gih gawirim**

**Le'netê li Melkemot tînim**

**Tif dikimê de**

**Û li ser singa rûpelên xwe**

**Pê re gemiş dileyizim**

**Piştî diya xwe**

**Ez carna tola wê ji xwe hildidim**

**Û carna ez hevparê çûna wê me**

**Û li sikakên Ewrupayê xwe binax dikim**

**Û bi zimanekî biyan Fatîhê li ser xwe dixwînim**

**05.02.2019**

# Hebû nebû

**Diya min hebû**

**Hîna saxbû**

**Ne miribû**

**Kurê wê bûm**

**Ew diya min bû**

**Berxê wê bûm**

**Ew maka min bû**

**Hebû nebû**

**Bilbilê wê bûm**

**Ew hêlîna min bû**

**Li ser eniya wê**

**Deqek hebû...**

**Deqa wê her tim li dar bû**

**Li deqê herdem buhar bû**

**Ew buhar jî, her şiyar bû**

**Wilo naz û her kubar bû**

**Hebû nebû**

**Diya min ya çav reş**

**Digel deqê**

**Xwediya navê xwebû...**

**Ku dihat**

**Ji wê ve**

**Gul dipişkivîn**

**Kulîlk diciviyan**

**Dîlan bû**

**Cîhan**

**Xweş bû**

**Bextê min**

**Sipî bû**

**Ji kû ve hatiban**

**Dilê min**

**Ji wir ve lê dida**

**Hebû nebû**

**Diya min**

**Keça Axê bû**

**Axa serwerê êlê bû**

**Sembola êlê jî**

**Deqa reş bû**

**Û li ser eniya diya min bû...**

**Deq xweşik bû**

**Sipehî bû**

**Ji sembola Hêtler**

**Navdartir bû**

**Ji Berê Reş**

**Pîroztir bû**

**Ji Îvilê bilindtir bû...**

**Serê min dixwerand**

**Dema heyî**

**Hêstirên min dimaliştin**

**Dema heyî**

**Xemên min dikuştin**

**Xwestekên min didane hev**

**Dema diya min hebû**

**Heye nîne**

**Diya min nîne**

**Ka sawêre, ka leylane**

**Ka jî gelo çi birîne**

**Çi mije çi dûmane**

**Nizam şemiye nizam îne**

**Gih dibêm xewne**

**Gih rasteqîne**

**Lê digerim ta ku bînim**

**Lê çavên min qet nabîne**

**Ka gelo raste, yan jî xewne**

**Yadê saxe yan namîne ???**

**Hebû...nebû**

**Diya min nîne**

**Diya min nebû**

**Ne ez jê**

**Û ne ew**

**Ji min têr nebû**

**Deriyê buhiştê**

**Li ber wê vebû**

**Yê min dojeh**

**Li ber min vebû**

**Hebû nebû**

**Diya min hebû...**

**31.01.2019**

# Ji nişka ve

**Derî vedibe**

**Ez dibêm qey diya min e**

**Telîfona min lê dide**

**Ez dibêm : ha yadê**

**Çixara min ku bi dawî dibe**

**Ez dibêm : te çima vemirand, yadê**

**Hîna hîna**

**Kenê min di devê min de ye**

**Yek ser ez digirîm**

**Ji nişkê ve tê bîra min**

**Ku diya min mir**

**Û niha miriye**

**07.02.2019**

# Cehneme

**Bi xêra jiyanê**

**Û mirina diya xwe**

**Min cehneme jî nas kir**

**28.05.2018**

# Çiye ?

**Ku ya te qeder be**

**Ya min çiye?**

**Yadê !!!**

**16.12.2018**

# Nasnameya min

**Ezê "Diya Min Mir" bikim nav**

**Paşnavê xwe bikim Sêwîme**

**Şeperzeme**

**Rêwîme**

**Awarteme**

**Qedexeme**

**Di her çar goşeyên nasnameya xwe de deynim**

**Li vê Dunya yê çêbû**

**Û lê nejiya**

**Xweda ew da lê nedayê**

**Nîşanên Cudawaz jî**

**Deqek li eniya diya wî bû**

**Dê çû**

**Û deq bû efsan**

**Deynim**

**Ezê bikim**

**Û bêjim**

**Bi soooooz..........**

**.......... 04.02.2019**

# Wilo

**Te wilo li min kir**

**Ku**

**Çi gava kenê min werê**

**Ez bigirîm**

**15.05.2018**

# Carê

**Carê xwîna min şêrîn bû**

**Lê niha**

**Diya min mir**

**29.05.2018**

# Bîrî

**Wa Yadê**

**Ma te jî bîriya min nekiriye ...?**

**Ez dipirsim**

**Yadê**

**Ka tu jî wek min digirî**

**Yan na**

**Gelo**

**Ev tu bê sozî**

**Yan Qeder ewqas Qehb û Are**

**Lê nexwe**

**Çawe tu ji hilma min nêzîktirî min bû**

**Û niha**

**Nefes**

**Henas**

**Û hilma min diçike di ber te de**

**Û te tenê**

**Alîk li vê kêlê**

**Û yek li wê kêlê**

**Paldayî**

**Matmayî**

**Bi vê jiyana xapok dikene**

**Û tew qolincekê jî naxwe**

**Qîrekê jî nade**

**Keserekê nayine xwe**

**Û bîriyekê nake**

**Ma wilo ye lêêêêêê**

**21.01.2019**

# Çawe

**Tu çawe çiwî û ew ma**

**Tu mirî û ew sax e**

**Û Çawe**

**Hîn**

**Goka zemînê li xwe dizîvire?**

**27.12.2018**

# Navê Yadê

**Xecxecokê**

**Diya minê**

**Ez qurbana navê te me**

**Dev bi kenê**

**Enî deqê**

**Ez heyrana çavê te me**

**Kurê te me**

**Maka minê**

**Ez neviyê bavê te me**

**Tirsrevînê**

**Hembêz germê**

**Gemya ser peravê te me**

**Xecîcayê**

**Dilmezinê**

**Êsîrê nav davê te me**

**Dîtin xewnê**

**Şêrîn peyvê**

**Parçek ji hinavê te me**

**Qirik zuha**

**Timî tî me**

**Berxa l' ser delavê te me**

**Ha ez ewim**

**Ew bi xwe me**

**Axad' bin pêlavê te em**

**Dewlemendê**

**Aqilmendê**

**Xizna zêr û diravê te me**

**Rû buharê**

**Enî geşê**

**Peşkek ji xunavê te me**

**Diponijim**

**Digirnijim**

**Qermîçoka lêvê te me**

**Bêparim ez**

**Mehrûmim ez**

**Mehrûmê wan çavê te me**

**Xecê Yadê**

**Xecîcayê**

**Giryanê wî navê te me**

**26.01.2019**

# Ez dizanim

**Ku sêwî**

**Xwîntehl in**

**Û niha ez sêwîme ....**

**Dizanim**

**Ku bêpişt in**

**Seqet in**

**Bê çarene**

**Û ez niha pişt şikestîme ...**

**Tê dighim ku ev dunya**

**Ne ya wan e**

**Û ne ji bo wan e**

**Û ez bê maf**

**Tê de rûniştîme ....**

**Ez baş dizanim**

**Ku**

**Sêwîtî**

**Ji Xerîbiyê**

**Ji bê dewletiyê tehltire**

**Bi ser de**

**Ez niha**

**Bê xwedîme ....**

**Qet ne dad e**

**Yek bi dê be**

**Dido bê dê bin**

**Li nav karwanê mirovan**

**Tim bi dirf in**

**Bi nîşan in**

**Û ez jî**

**Bê hemdî xwe**

**Tevlî karwên biwîme...**

**Bê Ihim**

**Û bê Destûr**

**Bê guneh**

**Û bê bela**

**Xweda rika xwe da min**

**Ez kor kirim**

**Ez ker kirim**

**Ji hiş birim**

**Û niha**

**Ji lewma**

**Bi nav mirov im**

**Lê bi xwe**

**Nesax û mirîme ...**

**Kî bawer dikir**

**Diya min wê bimre?**

**Kî digot**

**Wê Giryan**

**Ji dil bigrî**

**Û helbesta xwe**

**Tazî bike**

**wek  ku niha**

**Ken firot im**

**Hêstiran kirîme ...**

**Kî digot?**

**Kî bîr dibir?**

**Kî xwelî li min kir?**

**Kî diya min kuşt**

**Û**

**Ji xeyalan re**

**Hiştîme...**

**Lê wilo jî**

**Dizanim**

**Ku**

**Şil û şeht im**

**Seqet im**

**Xwehr im**

**Kêm im**

**Ne tiştek im**

**Tim melûl im**

**Û ji xwe ne Hewceye ku bêjim**

**Sêwîme ..**

**.............. 02.06.2018**

# Temen

**Temenê min**

**Bîst sal Ecnebî tî**

**Û du sal û nîv Kon**

**Û sê sal Oslenderîtî**

**Û heşt sal Şer in**

**Û niha**

**Temenê min**

**Bîst û şeş sal û diya min mirin**

**17.07.2018**

# Kurê Yadê

**Ez nizanim çawe radizim**

**Lê dizanim**

**Her sibeh**

**Li ser dengê te şiyar dibim**

**" KURÊ MIN ,RABE SER XWE DERENGE "**

**31.05.2018**

# Çixare

**Ew çixareya ku te nedihişt ez vexum**

**Niha**

**Ez**

**Jê bêhtir**

**Dişewitim**

**01.06.2018**

# Xwelî

**Wexta ez bi Dê bûm**

**Dunya tev ya min bû**

**Û niha**

**xweliya Dunyayê tenê ya min e**

**Û ji serê xwe pêve**

**Di nav de nabînim**

**31.05.2018**

# Yadê

**Bi çi rûyî**

**Wî kurê bê Namûsan**

**Rihê te**

**Ji te**

**Sitand?**

**Ha Yadê**

**31.05.2018**

# Xwediya Deqê

**Kanî tu îro, xwediya deqê**

**Bersiva pirsên min bidî...?**

**Navê xwe weka ahîna birîna min**

**Belav bikî**

**Deng vedî...**

**Van baweriyan**

**Bi cih bikî**

**Ku tu dîsa**

**Enî Deqê**

**Devê birînên min bidirû**

**Hefsarê azarên min kin bikî**

**Ku tu ji nûka**

**Tewla kenê min vedî.....**

**Tu kanî**

**Ku tu ji min bawer bikî?**

**Serhişkiyên min qebûl bikî?**

**Delaliyên min**

**Pîrbûn**

**Di dil de**

**Edab girtin**

**Tev teqiyan**

**Bûne kul**

**Û kul seridî...**

**Lê kanî tu**

**Xwediya Deqê**

**Bersiva xûzxûza singa min ya xetimî bidî...**

**Bersiva zimanê minî lal bidî...**

**Ya guhên min yên pînekirî**

**Bidî...**

**Ka gelo**

**Çi ji Deqa te bedewtire**

**Çi?**

**Ka gelo**

**Çi ji Deqa te**

**Binirxtire**

**Çi?**

**Ka gelo**

**Çi çiya xwe li asta bilindiya te didî**

**Çi?**

**Çi çem**

**Çi mêrg**

**Çi dehl**

**Çi kelh**

**Çi sînor**

**Ew çi nan e**

**Bi xwê ye**

**Ku ne ji destê te be**

**Çi?**

**De bêje**

**Ew çi koçerin**

**Ku pey te re penîr çê bikin**

**Çi?**

**Ew kî ne?**

**Ew çi şêraniya**

**Ku ne ji doba evîna te be**

**Ew çi rastiye**

**Ku ne tîrêjên şewqa Deqa te be**

**Xwedî Deqê**

**Ziman westiya**

**Qirik zuha bû**

**Û wêneyên te**

**Bîranînên te**

**Mane sing û di singa min de**

**Çûne xwar**

**Hestî derbas kirin**

**Damar çirandin**

**Û ez şaş û gêj**

**Şil û şeht**

**Bê kes û kûs**

**Sêwî**

**Pêxwas**

**Li sikakên Ewrupa**

**Girandim**

**Û terqedinyayî kirim**

**Lê**

**Ma ka bersiv gidî...???**

**26.11.2018**

# Çavtengî

**Tu jî**

**Hingî çavteng bû**

**Yadê**

**Te têra xwe tenê**

**Ji Kefen**

**Ji darbestê**

**Û ji gorê bir**

**Û ne fikirî**

**Bi tengbûna**

**Vê gerdûnê**

**Piştî te**

**Ya dê**

**31.05.2018**

# Deq

**Yê  ku deqa eniya Diya min ne dîtî**

**Heft xwelî**

**Sed ax**

**Hezar Icacok**

**Li serê wî be**

**31.05.2018**

# Qermîçok

**Ji qermîçokên di dêmên min de**

**Bê yî te**

**Kiyê min nas bike Yadê**

**31.05.2018**

# Elah Û Ekber

**Ez ji du tiştan têr nabim**

**Gotina : Elah û Ekber**

**Û dîtina deqa eniya  diya xwe**

**Diya min mir**

**Lê hîna Elah Ekber e**

**Û birîna min şil e**

**10.01.2019**

# Ez dibêm aaaaax

**Ez qolincan dixum**

**Û hin wan dihijmêrin**

**Ez rondikan dibarînim**

**Û hin wan bincil dikin**

**Ez dibêm aaaaaay**

**Ew dibên bê sûde**

**Ez dibêm aaaaax**

**Û ew dibên taaaaaaw**

**Ez dibêm yadêêêê**

**Û ew dibên**

**Mir...**

**Rehma xwedê lê be**

**Serê te sax be**

**Ciyê wê buhişt be**

**Jiyan wê berdewam be**

**Lê hih**

**Lê ax**

**Lê heyf**

**Û qed**

**Û sed meded………..**

**……. 02.03.2019**

# Derbdayiyên Derba Daxê

**Diya min goreke**

**Û li ser gorê**

**Axe**

**Hinek gul**

**Û du kêlin**

**Eşqa diya min deryaye**

**Har e**

**Xedar e**

**Dijwar e**

**Lidare**

**Zorbir e**

**Bîriya wê ez birim**

**Gih bi vir de**

**Gih bi wir de**

**Ez û wê**

**Peşko peşko**

**Ger û pêlin**

**Ez disincirim**

**Ez dikelim**

**Dişewitim**

**Li ser yadê**

**Nava min tenûr e**

**Dilê min dojeh e**

**Hestî pereng im**

**Çerim tiraf im**

**Hestên min sêl in**

**Di nav xewnan**

**Nav sawêran**

**Li pey rewrewkan**

**Digel leylanan**

**Şîretên te**

**Gotinên te**

**Ew bîranîn**

**Rût û tazî**

**Şil û şehtî**

**Û her sêwî**

**Min dihêlin**

**Diya min bîranîneke**

**Kûr û watedare**

**Tembûr e**

**Diya min**

**Ez Xelefim Xelefim e**

**Eyndîwerê Li Pey Texte**

**Xemên min perdene**

**Qêrînên min awazin**

**Hêstirên min têlin**

**Eniya Diya min zozane**

**Geliye**

**Çavên wê kanîne**

**Deqa wê nîşane**

**Pira Bafit e**

**Ez û hevalcêwiyên vê êşê**

**Pirpirîkin**

**Û carna**

**Hespê kihêlin**

**27.01.2019**

# Heft xwezî

**Xwezî ji dil**

**Topekê li min daban**

**Dema te digot : hey xwedê topek li te xistî**

**Xwezî bi rastî**

**Sukra min şikestiban**

**Xwezî**

**Mala min xirabûban**

**Çavên min teqî ban**

**Agir bi kezeba min ketiban**

**Xwezî**

**Yadê**

**Ez bam û ne tu ban**

**Heftxweziya min bi wan topan**

**Li ber sermaya sêwîtiyê**

**Yadê....**

**.................. 08.02.2019**

# Ka li deqa eniya diya min meyzînin

**Ka li deqa eniya diya min meyzînin**

**Ji wê, ji berê reş?**

**Ka li endeza wê meyzînin**

**Ew, yan Laleş?**

**Ka destê wê bixwînin**

**Ew yan Quran?**

**Ka li dengê wê guhdar bikin**

**Dengê wê yan Azan?**

**Li diranên wê yî zêrîn meyzînin**

**Ka ew yan xizne?**

**De werin û bawer bikin**

**Ku Mehrûmiya ji Deqê**

**Ne bi xwe mirine ???**

**Yan ne mirineke li ser miriyekî**

**Yan kuştine ?**

**Û ezê çawe ez bimînim**

**Heger mirina te**

**Ne dagirikirine**

**Yan**

**Henek bi mirovatiyê kirine**

**Henekbimirovatiyêkirine**

**Henek**

**Bi**

**Mirovatiyê**

**Kirine**

**Yadêêêêê............**

**....................... 02.01.2019**

# Hemî derewin

**Hemî rastî berya te**

**Derew bûn**

**Mirin**

**Êş**

**Û keserên derengiya şevê**

**Û hemî derew piştî te**

**Tekez bûn**

**Jiyan**

**Dad**

**Û bêparî**

**13.12.2018**

# Sibe

**Ez ê ji xweda re bêjim:**

**Ewê te şiyandî ku Erdoxan bikuje**

**Rêya xwe şaş kir**

**Û**

**Diya min kuşt**

**Ezê berdewam bikim**

**Û bêjim**

**Min diya xwe divê**

**Diya min**

**Li min vegerîne**

**07.07.2018**

# Izrayîl Efendî

**Izrayîlko...**

**Çav beloqo**

**Dev geniyo**

**Diran qîço**

**Sukir şikesto**

**Mal mîrato**

**Guh belo**

**Ser mezino**

**Hey zikreşo...**

**Ku tu nêr be**

**Ezê simbêlên te di rûyê te de bişewtînim**

**Wek ku te çawe kezeba min şewitand**

**Ku tu mê be**

**Ezê keziyê te ser serê te bikizrînim**

**Wek ku te çawe keziyên yadê kizirandin**

**Ku tu ne jin û ne mêr be**

**Ezê te pêxwas bikim**

**Te bi çol û bêranan bixînim**

**Wek te çawe ez lal kirim**

**Û werîsên xwe li sukra diya min gerandin**

**Ez Giryanim**

**Ji mala Seyro me**

**Kurê wê ya deq li ser eniya wê me**

**Ez va me**

**Lê tu?**

**Kiyî?**

**Kurê kî yî?**

**Û çi yî?**

**12.02.2019**

# Ta noqa xwe

**Heya bi noqê**

**Ditevizim**

**Dinalim**

**Digrîm li ser te ez yadê...**

**Diqîrim ez, diponijim**

**Kûzkûza  min e**

**Her wekû bayê sibatê...**

**Dinivîsim, her digirîm**

**Pênûs min şil kir**

**Bi van peyva nayêm qinyatê...**

**Çi torîk im**

**Çi wawîk im**

**Çi rovî me, ez çi gur im**

**Li wê çolê**

**Dilorînim**

**Li dor wan kêlan**

**Nayêm tebatê...**

**Çi berxikim**

**Mame bê mak**

**Barbara min**

**Gihişte jor**

**Bi hewara min ve**

**Qet kes natê...**

**Çi qêrîne ji kezebê**

**Ax û ax û hezar meded**

**Wez tije bûm**

**Bi ser ve çûm**

**Ji eşkenca dil**

**Ji vê kerbê**

**Ji vê şewatê...**

**Ji te yadê wez pîrtirbûm**

**Tevde çûm**

**Û**

**Tişt ji min nema**

**Komek hestî**

**Bi ser hev de**

**Mame termek**

**Li benda roja civatê...**

**Noq derbas kir**

**Tevde birim**

**Hêstirên min li ser Yadê**

**Ez noq kirim**

**Çawe diya min wê vegerê**

**Çawe ezê hew bigrîm**

**Û ezê çawe bi dest xim Felatê...**

**Lê Yadê**

**Waaa Yadê**

**Li ser te**

**Ji bo te**

**Kal bûm**

**Nemam bi carê**

**Kûrkûra min e**

**Ji nava min**

**Dengê miriya tê ...**

**12.02.2019**

# Ji hingî ve Ciya Min Mir

**În bû roj**

**Miha gulanê**

**18ê wê bû**

**Di du hezar û ijdehan de**

**Demjimêr 6:45**

**Min got: Elo, ha?**

**Wan jî got: Celal Ciya Te Mir**

**Ez nizanim çima min got ha**

**Çima min got Elo**

**Û nizanim çima Ciya Min Mir**

**Ji hingî ve**

**Ne ez delaliyên xwe lê dikim**

**Û ne ew**

**Bi min şa dibe**

**Ji hingî ve**

**................ 14.02.2019**

# Kî dikare ji Heqê deqê derkeve

**Ku diya min genimê xwe li ber bê dixist**

**Ji ber xwe**

**Genim bi alîkî**

**Şofan bi alîkî**

**Û xweşikbûn bi alîkî de**

**Dihatin dêrandin ...**

**Ku diya min genimê xwe li destêr dikir**

**Libo libo genim**

**Û yeko yeko kul**

**Dihatin hêrandin...**

**Ji xwe ku lavlavka xwe av dida**

**Pino pino**

**Pelo pelo**

**Geş dibûn**

**Û xwe li hevdû**

**Dialandin...**

**Mane mirîşk**

**Kurk û çîçikên wê**

**Ku êm dikirin**

**Rêzo rêzo**

**Li pey hev**

**Dîlan digerandin...**

**Çi sîmfonî bû**

**Çi bi tam bû**

**Tama wê çi xweş bû**

**Hinga diya min**

**Penîr li kûza dikir**

**Û kûzên xwe**

**Di bin axê de**

**Dihilandin...**

**Vêca zivistan dihat**

**Û berfê guhê erdê digirt**

**Ji nû diya min**

**Tenûr pêdixist**

**Û agir dida**

**Hevîrê xwe**

**Yê sitirhayî**

**Gilok bi gilok**

**Li nava ardê tirsa min dida**

**Û yeko yeko**

**Li tenûrê dicivandin...**

**Çi welat bû ku serê xwe li ber xweşikbûna diya mi**

**Dema diya min**

**Keziyên xwe ji hev diveqetandin...**

**Ew çi Şai'rin**

**Yadê**

**Karibin pesnê deqê bidin**

**Û**

**Ji Heqê deqê derkevin**

**Dema çav li deqê bêne gerandin...**

**14.02.2019**

# Yadê

**Va min deqa te**

**kire dîwanek**

**Û Têde min li pey hev**

**helbest xêz kirin....**

**Min ew deq kire zincîrek**

**Min zincîr dirêj kir**

**Laşê te**

**Endam bi endam**

**Min kire sitran**

**Û yeko yeko**

**Xelek min rêz kirin...**

**Ew kulîkên te çandîn**

**Min bîn kirin**

**Min dîse av dan**

**Û tevlî şaxên wan**

**Min hembêz kirin...**

**Berxikên te yên virnî**

**Min ji makên wan qut nekirin**

**Na !!!**

**Min dîse şîr dan**

**Digel xewnên xwe**

**Ew çêrandin**

**Û tevlî pêz kirin...**

**Ew şîretên te li min kirîn**

**Min dîse gotin**

**Bawerî bi wan min vejînkir**

**Min anîne zimên**

**Ew şahîk kirin**

**Û bêhtir bi hêz kirin...**

**Piştî deqa eniya te ya pîroz**

**Min li xwe Heram kir**

**Êdî**

**Bawerî bi dadê**

**Min bêhtir**

**Xewn û sawêrk**

**Ji xwe nêz kirin...**

**16.08.2018**

# Welatê Min

**Ew welatê ku kesî nikarîbû min tê de dagîr bike**

**Hembêza diya min bû...**

**Kesî nediwêrî mafê min bixwe**

**Destûra şîretên wê bû...**

**Şûrê min zimanê wê bû**

**Sînor**

**Evîna wê bû**

**Alîk cîhan bû**

**Û yê din**

**Li ser eniya diya min bû**

**Welatê min**

**Dagîr bû**

**Yacûck û Macûcka dest danîn ser**

**Ji min sitandin**

**Welat binax kirin**

**Û**

**Ez li ser axê**

**Sergon kirim..................**

**13.11.2018**

# Awazên Qêrînên Min

**Ev qerebalixa li ser van rûpelan**

**Rasteqîne**

**Belgene**

**Kêliyên ji dilin**

**Simbilên deşta Girkê Xiznê ne**

**Xumuma hêstirên mine**

**Diya mine ...**

**Vê qerebalixê**

**Wilo bixwînin**

**Hêdî hêdî zimanê xwe bilivînin**

**Hîn birînên wê şilin**

**Û tayên wan nerizîne**

**Hîn dev li kene**

**Û nizane ku miriye**

**Yan serê wê şiştine...**

**Rêya Şamê ya malmîrat**

**Asîmanê Qamişloka bêxwedî**

**Çav li rê ne**

**Xembarê hatina xwediya deqê ne**

**Nexweşxaneyên Paytextê**

**Tev nexweşin**

**Derziyên Dektoran**

**Serî xwehr kirine...**

**Dilê diya min**

**Bi kêr û Şifran**

**Vekirine...**

**Hinavê wê**

**Tijî xwîn kirine**

**Ji nava wê**

**Kezeb hilkirine...**

**Ev rasteqîne**

**Wilo kirin**

**Û wilo çêbû**

**We navê bawer bikin**

**Wa Diya min, digel deqa xwe**

**Li çola Girkê Xiznê**

**Binax kirine... ...........**

**09.10.2018**

# Deqa Wê Wilo

**Deqa eniya diya min**

**Wilo**

**Û**

**Wilo**

**Û**

**Wilo**

**Û wilo bû**

**Hinekî bi vir de**

**Hinekî bi wir de**

**Ha wilo**

**Û wilo bû...**

**Ya nivîsandî  jê re**

**Ehla Xwedê bû**

**Şêxa keça Şêxa bû**

**Ji dêlva Hibrê**

**Bi ava zêr**

**Ji dêlva Qelemê**

**Bi pirtikan**

**Neqişandibû**

**Xepartibû**

**Nivîstibû...**

**Wek Ayetan**

**Li hev anî**

**Alîk li xwar**

**Yek li banî**

**Tew xalek jî**

**Li nav danî**

**Hûrik hûrik**

**Bi ciwanî**

**Anîşk anîşk**

**Piço piço**

**Mû bi mû...**

**Endezyar tev**

**Jê mat mane**

**Nîgarkêş tev**

**Li ber westane**

**Hina digot**

**Ev Ecêba heştê ye**

**Hina digot**

**Ev ne karê Insane**

**Hin mabûn**

**Bên sed Maşelah**

**Ev deqa Xecê çi ciwane**

**Çi xweşik û çi girane**

**Çi balkêş**

**Û çi watedar**

**Û çi xweş nîşane**

**Dawî tevde diwestiyan**

**Ji nû digotin**

**Ev karê yezdane**

**Çi hosta û çi rêzane**

**Çi zana û çi hozane**

**Heft Ecêb li ser rûyê erdê ne**

**Ya heştê**

**Li ser eniya Xeca Evleye**

**Diya Giryane**

**22.08.2018**

# Ji Xêra Xwedê Re

**Ji xêra xwedê re**

**Diya min maban**

**Bila her heft xalê min û her yazdeh xaltîkê min**

**Û ez jî bi wan re çûban**

**Agir bi malê ketiban**

**Lehî rabûban**

**Tev mal û mewdan**

**Li ber çûban**

**Ji xêêêra xwedê re**

**Hema bes diya min maban**

**19.02.2019**

# Bihna Diya Min

**Bihna te ji xwe dikim**

**Xwe bihn dikim û bihn dikim**

**Destên xwe li xwe dipêçim**

**Û çavên xwe digrim**

**Wek sermestan**

**Şa dibim**

**Dikenim**

**Devê xwe qamekê ji hev vedikim**

**Diya min**

**Yadê**

**Ma qey ev ne pozê min e**

**Yan**

**Çermê te ne yê te ye?**

**Ez dipirsim Yadê**

**Ku çermê te ne yê tebe**

**Ma çarika te**

**Kiras û xiftanê te**

**Hilma te**

**Keziyên hinekirî**

**Û destdan**

**Û ji xwe**

**Ji xwe deqek li ser destê te jî hebû**

**Ma ew jî**

**Yadê**

**Ne yên te ne**

**Dipirsim**

**Nexwe eva ku bihn dikim kî ye**

**Û ev bihn çî ye ?**

**Pa xwezî**

**Pozê min jê bûban û min şaşo maşo**

**Gêjo mêjo**

**Nekiriban**

**Û min bihna diya xwe**

**Û bihna mirinê**

**Ji hev veqetandiban**

**Û nas kiriban**

**Pa xwezî... xwezî Yadê xwezî**

**25.02.2019**

# Yadê Te Çi Kir

**Çi belengaz mane**

**Sikakên Girkê Legê**

**Kolanên Dêrikê**

**Çi biyanin**

**Çi wek minin**

**Çi sêwîne...**

**Çi melûlin li ser te yadê**

**Çi xweliyê bi xwe de dikin**

**Çi xwelî ne**

**Te çi bi wan kir**

**Çi bi min kir**

**Te yadê**

**Çi kir?**

**Sêwî ye ev qad bê te**

**Ne kirasê te li serê digere**

**Û ne xiftanê te bîn dike**

**Ne ji miska te serxweş dibe**

**Û ne ji Hizûra te li xwe diqulibe**

**Ev te çi kir ?**

**Bawer bike Dêrik şîne**

**Girkê Legê ya xweşik bû**

**Ya delal bû**

**Meydana gera te**

**Ya ku tu nedihat**

**Ew dihat**

**Ya piçûk**

**Digrî**

**Sernizme**

**Mezin bû**

**Mezin bû**

**Bû dax**

**Di rûyê erdê de**

**Bû êş**

**Êş e**

**Êş e êş**

**Wek mine**

**Wek çûna teye**

**Yadê**

**Ka te çi kir?**

**............... 02.02.2019**

# Xweşikbûn

Xweşikbûn û her tişt diya min bû

Rastî û her tişt diya min bû

Nemirî û di pey re

Bilindbûn û di ser re

Kûrahî û di bin re

Man û bi wir de

Hîn bi wir de...

Çûna wê, nemana min

Hesretên wê

Axên min

Mereqên wê

Kerba min

Xemên wê

Nezanîna min

Bêpariya ji hembêza wê

**Qolincên min**

**Kezeba wê**

**Û Xerîbiya min**

**Mirina wê**

**Û sêwîtiya min**

**Bûne xwê**

**Û herikîn bi ser de...**

**28.02.2019**

# Wa yadê...

**Îşev ev hate bîra min**

**Û min niha lê anî der**

**Birîna min**

**Biqasî dilê te mezin lê hatiye?**

**Vêca çawe ku hêstirên min şor bin**

**Û bi ser de bibarin**

**Ka tu bi xwedê kê**

**Çi qîrîn wê bihna min fereh ke**

**Ku ne di guhê te de be?**

**28.02.2019**

# Oxirê...

**Te çend xewn di tariya şevê de**

**Beravêtî kirin?**

**Te çend karwan ji rê xistin**

**Te dane alî ?**

**Te çend rê westandin**

**Ew li hev badan ?**

**Te çend dil**

**Çend kezeb**

**Çend çeng û tilî**

**Bi arê şewata xwe birajtin?**

**Çend bêrîk di çend gewdan de vekirin?**

**Te çendên wek min bi darve kirin?**

**Te rewanê me di navbera qirikê û sêdarê de**

**Li hewa hişt?**

**Oxirê...porbirê**

**…………………….. 03.03.2019**

# Yê bê welatin

**Tim mişextin**

**Tim bêzarin**

**Penaberin**

**Her rêwî ne...**

**Yên bê yarin**

**Ji xwe xembarin**

**Tim xemxwarin**

**Bi derdan re**

**Bi janan ne**

**Hevalcêwî ne...**

**Yên xizanin**

**Bê diravin**

**Bêrîk vale ne**

**Tim çavên wan**

**Li destê wê û wî ne...**

**Yên wekû min**

**Kêmin li dinyê**

**Bi nîşanin**

**Dirfkirîne**

**Dilnazikin**

**Çav şilin**

**Bêhalin**

**Bê xwedîne...**

**Ji ber ku**

**Sêwî ne**

**Sêwî ne**

**Sêwî ne ...**

**Bi ser de bêwelatim**

**Û rêwî me**

**Bi derd û azarim**

**Dostê xemam e**

**Û cêwî me**

**Henekçiyê devê**

**Wê û wî me**

**Diya min nîne**

**Û sêwî me...**

**03.01.2019**

# Çi Gunehê Diya Min Bû

**Çi kiribû diya min**
**Heta ku mir?**

**Yan çi guneh kiribû**
**Heta ku xwedê ew bir?**

**Ji hinga ez wê nas dikim ve**
**Ew gulan diçîne**
**Û yên çandî av dide**
**Û yên av dayî bîn dike**
**Û ji bîna xwe nerm dike kevir...**

**Ji şêst û çar salan ve**
**Ew xweşikbûnê dirêse**
**Û bedewiyê dihûne**
**Û xeman dimale**
**Ji vir û carna ji wir...**

**Xwedê dizane bê min çend caran**

**Fir li singa wê dane**

**Û jê, min çend Litir şîr mijtine**

**Çi ji derve**

**Û çi ji hundir...**

**Erdoxan derbasî Efrînê bû**

**Çeteyên wî dar birîn**

**Gul kurastin**

**Mêw hilkirin**

**Zengelor çirandin**

**Ta bi pêl mîrok û kurmên me kir...**

**Xweda ew nekuşt**

**Lê keziyên diya min a çav reş**

**Yên wek du sûlavên bilind**

**Li qirika wê gerandin**

**Û alandin**

**Heta ku**

**Yadê mir....**

**Ji hingî ve tî me**
**Birçî me**
**Mehrûmim**
**Bêxwedî me**
**Û**
**Tenê kulan dadiqurpînim**
**Xeman dixum**
**Û her ahînek ji ya din mestir...**

**Qurçikên şevê**
**Yên vala**
**Devê birînên tûj**
**Nehperûşkên sawêrkan**
**Pîrebokên li ber derî**
**Sitêrên xeyidî**
**Rondikên min yên çirisandî...û ez digrîm**
**Û**
**Hêstirên xwe dihijmêrim**

**Hêêêstir**

**Bi**

**Hêstir....**

**30.08.2018**

# Nizanim

**Ku ji min hatiban**

**Minê destê xwe kiriban zikê erdê de**

**Minê ew berûvajî kiriban**

**Minê li hev qulibandiban**

**Tu serax kiriban**

**Û**

**Yên din tev**

**Hemî**

**Digel hev**

**Binax kiriban**

**Lê çibkim?**

**Ez nizanim**

**Ne destê min kin e**

**Û ne**

**Ev zemîn kûr e**

**Yan pehn e**

**Yan mezin e**

**Û yan jî dirêj e**

**19-3-2019**

# Li Ber Min

**Li ber min**

**Gora te**

**Ji vê gerdûnê ferehtire**

**Wek ku**

**Di sola xwe de bim**

**Û**

**Pêl xwe bikim**

**Wek ku**

**Ez yekî din bim**

**Û di çermê xwe de bijîm**

**Li ber min**

**Wek ku**

**Diya hineke din miribe**

**Û**

**Ew di Iyarê min de bi cî kiribin**

**Li ber min**

**Tu saxî**

**Û namirî**

**22.02.2019**

# Ma Heye

Ez dizanim

Ku hemî bêjeyên dunyayê heq ji bedewiya deqa t
dernakevin

Lê ezê bêjim...

Ez dizanim

Ku qeftên helbest û dîwana bihna min fereh nakir

Lê ezê binivîsim...

Ez dizanim ku ev Defter nabine text

Lê ezê li serê bibezim...

Nabin gulîkeziyên te

Lê ezê bi wan bilîzim...

Ez dizanim

Birîna kul

Ya vebûyî

Bi ax û xweziyan nayê hev

Lê zê biqîrim...

**Dizanim**

**Ku bi xweziyan**

**Kes ranajê biskên keziyan**

**Lê ezê destên xwe bipelînim...**

**Ku kesî bi giriyan, mirî ranekirine**

**Lê zê bigrîm...**

**Ku berî min, ti daxdayiyan, serê xwe hişk nekirine**

**Û bi demê re qayîş nekişandine**

**Berberî bi Qedrerê re nabe**

**Û nekirine**

**Lê zê bikşînime**

**Ezê bikim...**

**Di kur ve zirav be, bila biqetê**

**Bila biçirê, bidirê**

**Ne kula mine**

**Û ez nakim xem...**

**Ez dizanim**

**Lê yadê**

**Ma heye tu zanibe**

**Ku tûj e**

**Bê te ev der?**

**23-3-2019**

# Kî Bû ?

**Çi endezyar bû**

**Ya ku ew deq neqişandî**

**Çi hosta bû**

**Ewa ku deq afirandî**

**Ji rengê berê Reş û jê xweşiktir jî**

**Ew deq li wir nivîsandî**

**Ava gula lê reşandî**

**Xîşko xîşko**

**Lib lib**

**Deqa pîroz ya hûnandî**

**Ser hev re û bin hev re**

**Li hev gerandî**

**Sembola jînê**

**Dergûşa xewnan**

**Teniştek li buhiştê**

**Û yek**

**Di dilê min de çikilandî???**

**02.02.2019**

# Wê Tiştê

**Wê tişta ez**

**Bêhtir êşandî**

**Xewna ku ez**

**Pêxwas**

**Li diniyê gerandî**

**Wê çixara ez**

**Bêhtir kişandî**

**Nûçeya ez**

**Her hejandî**

**Derdê ez xwarî, ez helandî**

**Derba**

**Ji dil**

**Ez dayî erdê**

**Li hev qulbandî**

**Kêlîka nervîn**

**Boyî destar**

**Û ez**

**Di nav pencên xwe de hêrandî**

**Nemana deqê bû**

**Çûna te bû**

**Ya ez ji ber çavê jînê veşartî**

**Ez hilandî**

**11-11-2018**

# Wek diya min

**Wek diya min nîne kesek**

**Ku ez bêjimê de Yadê**

**Ewqas dilnaz û singfereh**

**Ku pêk bîne vê miradê**

**Yan şiyar û amade be**

**Bêb' hewara vê firyadê**

**Wek diya min ne çêbûne**

**Ne çê dibin li vê qadê**

**Bi soz heya ku ez saxim**

**Ezê bankim, bêjim Yadê**

**Bi tevî ku bersiv nebê**

**Lê ezê her bankim Yadê**

**Piştî herdû çavên belek**

**Vê gerdûnê didim ber dasê**

**Vala dikim, bar dikim ez, li seradê** **30.03.2019**